
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1031 | 15-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Di arşîvan de Kurd û Kurdistan

**Li Fransayê "Muzeya Albert Kahn" arşîveke ku 70 hezar wêne tê de hene, li xelkê vekir. Bankavanê Fransî, Albert Kahn sala 1908'an 12 wênegir peywirdar kirin da ku li dinyayê bigerin û wêneyan bigirin. Di nav arşîva van wênegiran de wêne û videoyên ku li Kurdistanê hatine girtin jî hene.**

Li Fransayê "Muzeya Albert Kahn" bi arşîveke nû derdikeve pêşberê xelkê. Di arşîva muzeyê de wêneyên bi reng yên ku destpêka sedsala 20'an hatine girtin, hene. Muze bi vê yekê berê xelkê dide rabihuriyê û dixwaze kesên li van wêneyan dinihêrin, li wê heyamê bifikirin û lê bihizirin. Ji lewre di arşîvê



de derbarê hin welat û çanda wan de wêne û vîdeoyên balkêş hene. Muze bi projeya "The Archives of the Planet" ku hewl dide arşîvên kevn dijîtalîze bike, 70 hezar wêneyên kevn ên bi reng, bi qelîteyên baş derdixe pêşberî bîneran. Di nav van wêne û dîmenan de gelek jî li Kurdistanê hatine girtin. Li bajarên Kirmaşah, Mûsil û Zaxoyê gelek wêne û vîdeo hatine girtin. Her wiha dîmenên Êzîdiyên li Mor Yaqubê jî hatine girtin.

### 12 wênegirên li dinyayê digerin

Bankavanê Fransî, Albert Kahn sala 1908'an xwest mirovahiyê û her wiha civakên li dinyayê bi riya wêneyan bide nasîn. Wî ji bo vê yekê jî foneke mezin veqetand û gelek pere xerc kirin. Albert Kahn ji bo vê projeya xwe bibe serî, 12 wênegirên profesyonel wezîfedarkirin û ev 12 wênegir li dinyayê belav bûn. Ji bo vê projeyê wênegir li gelek welatan geriyan. Projeya Albert Kahn sala 1931'ê bi dawî bû. Ji ber ku rewşa borsayê ne baş bû Kahn jî sala 1929'an îflas kir. Wênegiran di nava van salan de gelek wêne girtin û li dinyayê bûn şahidên gelek bûyerên cihê. Helbet li gel girtina wêneyan, wênegiran têra xwe dîmen jî girtibûn. Koleksiyona ku van wênegiran ava kiribû, berfireh bû. Ji sala 1990'î heta îro Muzeya Albert Kahn koleksiyonê bi awayekî online nîşanê xelkê dida, lê ji ber malpera wan kevn bû û qelîteya wênayan jî ne baş bûn bala xelkê nedikişandin ser xwe.

### Arşîveke xurt û 70 hezar wêne

Lê piştî xebatên dûr û dirêj niha Muzeya Albert Kahn malpera xwe nû kir û belgeyên ku wênegir girtibûn bi qelîteyeke baş ji nû ve derxist hemberî xelkê. Muzeyê arşîva xwe ji sedî 80'ê ji xelkê re vekiriye û xelk dikare bi awayekî online xwe bigihîne van wênayan yan jî belgeyên din yên ku di nava wan salan de hatine girtin. Yanî 70 hezar wêneyên di navbera salên 1908 û 1931'ê de hatine girtin, li ser malperê belav kirine. Lê zimanê malpera ku arşîv tê de hatiye bicih kirin, tenê Fransî ye, ev yek dike ku xelk zehmetiyê bibînin. Lê bi riya Google Translate, ev yek jî tê çareserkirin û xelk dikare bi rehetî ji çavkaniyê sûdê werbigire.

### Kurd bi cilûbergên xwe Kurdistan jî bi rengê xwe

Dema min berê xwe da arşîva muzeyê, wêneyên ku li Kurdistanê hatine girtin bivênevê bala min kişandin ser xwe. Wêne û dîmenên li Kurdistanê hatine girtin derbarê çand û jiyana wî zemanî de gelek tiştan berbiçav dikin. Wêne û dîmenên Kurdistanê di sala 1927'an de hatine girtin. Li bin wêneyekî nivîsandine "Jinên Kurd ên ciwan" her wiha li bin wêneyekî jî nivîsandine "Kalemêrekî Kurd", di her du wêneyan de jî Kurd bi cilûbergên xwe li pêş in û pirr lihevhatî ne. Li gel van wêneyan, wêneyên Çemê Dîcle û Zaxo jî balkêş in. Çend gundên ku ji wan re gotine gundên "Mar Yakoub" jî balkêş in. Yanî beşeke xurt a arşîvê jî li Iraqê hatiye girtin, li hin cihan yekser navê Kurdistanê bi kar anîne û li hin cihan jî Mezopotamya hatiye gotin. Li ser wêneyên "Mar Yakoub" Iraq hatiye nivîsandin, lê Manastira Mar Yaqûb li Nisêbînê ye û li Torê jî dêra bi heman navî heye. Wekî din bi heman navê manastirek li devera Qelemûn a Libnanê û deşta Nînovayê jî yanî li Başûrê Kurdistanê çend dibistanên bi heman navî hene. Em ji ber cil û bergan dikarin wiha texmîn bikin ku ev mirov ne dûrî Dihokê, lê li aliyê deşta ber bi Mûsilê ve ne. ***Ozgurpolitika***

# 'Ji ber êrişên dewleta Tirk daristanên Soran ber bi tinebûnê diçin'

**Berpirsê Desteya Rêxistinên Jîngehparêz a Soran ragihand ku hem li hindir hem jî ji derve, daristan tên talankirin, ji ber bombebaranên dewleta Tirk û Îranê jî daristanên herêmê ber bi tinebûnê ve diçin. Berdevkê Parastina Şaristanî jî da zanîn ku ew ji ber êrişan nikarin karmendan bişînin herêmê.**






Êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Kurdistanê bê navber dewam dikin, dewleta Tirk ne tenê êrişî xelkê sivîl dike, xwezaya Kurdistanê jî talan dike. Herwiha bi hatina werza zivistanê re jî, ji ber ku hikumet neftê belav nake, welatî berê xwe didin dar birînê. Ev jî bandorek nerênî li xweza û daristanên Başûrê Kurdistanê dike.

Derbarê mijarê de berpirsê Desteya Rêxistinên Jîngehparêz a Soran Hejar Mahîr ji Rojnews re axivî. Hejar Mahîr da zanîn ku bi du awayî daristanên îdareya Soran tên talankirin û got; "Li aliyek bombebarana dewleta Tirk û Îranê, li aliyek din de jî ji bo xwe germkirinê dar tên birîn. Ji ber bombebaranên dewleta Tirk û Îranê daristanên herêma me ber bi têkçûnê diçin."

Hejar Mahîr di dewama axaftina xwe de got; "Em bang li aliyên peywendîdar dikin rê li ber birîna daran bigrin, li şûna çandina darên nû, nehêlin darên ku temenê wan 200 sal zêdetirin werin birîn."

Berdevê Parastina Şaristanî ya Soran Beyar Balek jî li ser heman mijarê ji Rojnews re axivî. Beyar ragihand ku sala borî li herêma wan 182 buyerên şewatê çêbûn, di encam de gelek puş û daristan şewitîn. Beyar got ku beşek mezin jî ji ber topbaran û bombebarana dewleta Tirk û Îranê şewitîn. Beyar di dewama axaftina xwe de got; "Em nikarin karmendên Parastina Şaristanî ji bo herêmên ser sînor bişînin, ji ber ku topbaran heye û metirsî li ser jiyana wan çêdibe."

Berdevkê Polîsan yê Parastina Şaristanî ya Soran Emîr Xoşewî jî got; "Bê guman bombebaranên dewleta Tirk ji bo têkçûna daristanan û şewitîna puş bi bandore. Lê em nikarin biçin cihên ku agir pêdikivin, ji ber ku qedexeye." ***-ROJNEWS***

Sudoku:Pirs 41

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | | | | 6 | | 3 | 4 | |
| 2 | 7 | | 9 | | | | | |
| | | | | 4 | 7 | | | 8 |
| 1 | | 8 | 6 | | | | 7 | |
| | | | 3 | | 9 | | | |
| | 2 | | | | 8 | 4 | | 1 |
| 3 | | | 4 | 7 | | | | |
| | | | | | 2 | | 1 | 6 |
| | 8 | 1 | | 9 | | | | 4 |

Sudoku: Bersiv 40

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 1 | 3 | 4 | 5 | 2 | 9 | 7 | 6 |
| 2 | 5 | 7 | 1 | 6 | 9 | 8 | 3 | 4 |
| 4 | 6 | 9 | 3 | 8 | 7 | 2 | 5 | 1 |
| 6 | 7 | 4 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 8 |
| 3 | 9 | 1 | 6 | 2 | 8 | 7 | 4 | 5 |
| 5 | 2 | 8 | 7 | 4 | 1 | 3 | 6 | 9 |
| 1 | 3 | 6 | 9 | 7 | 5 | 4 | 8 | 2 |
| 9 | 8 | 5 | 2 | 3 | 4 | 6 | 1 | 7 |
| 7 | 4 | 2 | 8 | 1 | 6 | 5 | 9 | 3 |

## Quncika Têgînan

| Ast | **Pile, rade, derece, sewiye, hîza, darax. Bilindî û nizimiya tiştekî: Filankes di mijara ziman de ne di asta filankes de ye.** |
|---|---|
| Belge | Tişta ku tiştekî misoger dike. Delîl, govan, dokûment. Sûcê filankesê hat belgekirin. Belgeya ku min pere dayînê di destê min de ye. |
| Dane | Agahî. Daneyên di destê me de têra sûcdarkirina wî dikin. |
| Demografî (Fransî) | 1.Lêkolînên li ser komên mirovan yên ku li herêmekê dijîn. 2.Gelhe, nifûs, xelk, komên mirovan yên li herêmekê dijîn. Dagîrker demografiya Kurdistanê diguherînin. |
| Klînîk (Fransî) | Ciyê ku venêrîna nexweşan lê tê kirin. |
| Maske (Fransî) | Rûpoş, berû, girtek, rûyîn, mask, berdevik |
| Nivîsgeh | Dezgeh, daîre, bûro, ofîs. Ciyê ku karê nivîsê lê tê kirin. |
| Sînevizyon (Fransî) | Ekranên gelek mezin, televizyonên gelek mezin. |
| Stratejî (Fransî) | Ji bo demên dirêj plan û proje. |
| Venêrîn | Pişkinîn, teftêşkirin: Di ketina bajêr de endamên asayişê li me venêrîn. Bijîşk li nexweş venêrî. |



## Êrîşên dagirkeriya Tirk bênavber dewam dikin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragehand ku artêşa Tirk a dagirker çeperên berxwedanê yên li herêma Çamçoyê carekê bi bombeyên qedexe û 7 caran jî bi çekên kîmyewî bombebaran kir. R-3



Farûk Sakik
2023....
R-4



Ahmed Aktaş
AKP û HUDA PAR
R-5


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1031 | 15-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# DEWLETA TIRKIYÊ: KUJERA JINÊN AZADIXWAZ



## Dagirkeriya Tirk Jinên herî jîndar di cîhanê de dike armanc

Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, jina Kurd ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê têkoşîneke xurt pêşxist û ji bo jinên azadîxwaz yên cîhanê bû pêşeng. Dewleta Tirk û hêzên hegemon jî, jina azad li ser desthilata xwe xeter dibînin û wê dikin armanc. ***R-5***



## Ronahî Serhat: Jinan li hember pergala

Endama Meclîsa PAJK'ê Ronahî Serhat diyar kir ku bê azadiya jinê tu pergal azad û demokrat nabin û got, tevahî jin li hember pergala zayendperestî serî rakirin e û bêyî azadiya jinê jî wekhevî û edalet nayê. ***R-4***

## Komîteya Sotemeniyê: Eger derfetên me hebin emê careke din mazot li welatiyan belav bikin



Li Qamişlo welatî daxwaza beşa duyem ya belavkirina mazotê ya malan dikin. Li ser vê jî Komîteya Sotemeniyê ya bajarê Qamişlo got, Eger derfetên me hebin û beşek din ji mazotê bi dest me bikeve, emê careke din mazotê li welatiyan belav bikin. ***R-6***

## Mala jinê di 2022`an de ji gelek pirsgirêk û dozên jinan re bû cihê çareseriyê




Mala Jinê ya bajarê Qamişlo di 2022`an de gelek kar û xebat da meşandin. Li ser vê rêvebera Mala Jin Behiya Mûrad da zanîn ku di sala borî de 750 dozên jinan gihîştine ber destê wan, ji wan jî 562 doz çareser kirine. ***R-2***

## Temenê mezin û rewşa koçberiyê jê re nebûn asteng

Jina kurd ya afrîner û kedkar a bi navê Zeyneb Xelîl, tevî hemû zehmetiyan jî, di bin çadirên koçberiyê de bi firotina xişiran zarokên xwe xwedî dike û debara jiyana xwe dike. **R-2**

# Mala jinê di 2022`an de ji gelek pirsgirêk û dozên jinan re bû cihê çareseriyê

Mala Jinê ya bajarê Qamişlo di 2022`an de gelek kar û xebat da meşandin. Li ser vê rêvebera Mala Jin Behiya Mûrad da zanîn ku di sala borî de 750 dozên jinan gihîştine ber destê wan, ji wan jî 562 doz çareser kirine.

**Rojbîn Zagros/Qamişlo**

Destpêka şoreşa Rojava, bi armanca rizgariya jinê ji bendên koletiyê Mala Jinê hat vekirin. herwiha ev sazî giringî da mefê jinê û hewl da ku mafê wê ji kevneşopiyên civakê yên paşverû û hişmendiya nijadperest, biparêze. Jixwe ji avakirina wê hete roja îro gelek doz û pirsgirêk bi rengekî asayî hatine çareserkirin. Herwiha di avakirina têkiliyên civakî de jî rolek baş lîstiye û bûye bingehê avakirina civakeke demokratîk.

Di sala 2011`an de yekemîn mala jinan li bajarê Qamişlo hat vekirin. Herwiha li kantona Qamişlo deh navendên girêdayî mala jinê hene, ku piraniya wan li bajarên sereke yên wek Amûdê, Tirbespiyê, Çilaxa, Dêrik, Til Hemîs, Til Koçer, Til Birak, Girkê Legê û Qamişlo ne. Di Mala Jinê beşa Rêveberiyê, Komîteya Lihevanînê û Arşîvê heye. Herwiha Komîteya Lihevanînê ji 3 jinan pêk tê ku li ser pirsgirêkên jinê û malbatî yên ku tên ber destê wan disekinin. Di heman demê de ev jin di van dozan de zana û xwedî tecrûbe ne. Ji bo wê jî pirsgirêk û êşên ku bi jinan re derbas dibin rojane diçin Mala Jinê. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan Mala Jinê gelek kar û xebat dane meşandin, taybet îsal di nava kar de bi gelek zehmetiyan rûb rû mayin e.

Ji her alî û ji her cureyê jiyanê ve pirsgirêk tên gel mala jinê. Pirsgirêkên jin û mêr yên malbatî, zewicandina zarokan, revandina jinê, xiyaneta zewacê, zewaca ser jinekê re, şideta li ser jinê û bêparbûna jinê ji mîrasê malbatê hene.

Dema ku jin doza xwe radestî mala jin dike, mala jinê her du milê dozê vedixwînin da ku pirsgirêk û gotinên wan piştrast bikin. Pişt re ji bo niqaşakirina pirsgirêkê, her du milan bi hazirbûna Komîteya Lihevanînê, tînin gel hev û nîqaşê bi wan re dikin. Herwiha hewl didin ku pirsgirêk bi rengekî adil ji bo her du milan were çareserkirin. Dîsa Mala Jin di vê salê de di nava




kar û xebatên xwe de gelek perwede dan. Lewra tiştê herî girîng û pêwîst di jiyana mirov de perwerde ye, hem perwerdeya jinan hem ya civakê. Çimkî bi perwerdekirina civakê jin jî digihêje mafê xwe. Ji bo wê jî mala jin li gelek akademî û saziyên rêxistinê, herwiha li nava tax û komînan perwerde dane. Herwiha her ku pirsgirêkekê jî çareser dikin, wê dikin mijara perwerdeyê. Ji bilî perwerdeyan jî gelek pêngav ji bo jinê hatin destpêkirin, bi taybetî pêngava têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê her sal tê lidarxistin.

Derbarê kar û xebata mala jin ya sala 2022`an de û dozên ku ji wan re hatîn rêvebera Mala Jin ya bajarê Qamişlo Behiya Mûrad ji me re axivî û got, di destpêka damezrandinê Mala Jin de, jin kêm dihatin û şerm dikirin pirsgirêka xwe ji me re parve bikin. Lê niha bi sedan jin tên gel me û doza mafê xwe dikin.

`Piştî avakirina Mala Jinê êdî jin li dijî tundî û neheqiyê bêdeng namînin`

Bahiya di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ev 5 hezar sal in li ser jinê şidet tê kirin. Di her alî de zor li jinê tê kirin. Sedema wê jî hin caran ji bêdengiya jinê ye. Gelek jin ji bo zarokên xwe neçar dibin li hemberî zora li ser xwe bêdeng bimînin. Zilam jî vê ji bo xwe derfeteke bi karaninê dibîne. Gelek sedemên şideta li ser jinê hene; ne zilam tenê, hin caran civak jî jinê qebûl nake. Eger jin bixwaze tiştekî bike civak qebûl nake. Ev tev li pêşiya jinê dibin asteng û nahêlin bi xweşî bijî û li ber xwe bide. Lê Piştî ku şoreşa jinê hat lidarxistin û gelek sazî û navendên girêdayî wê hatin vekirin êdî jin dikare bi rehetî mafê xwe bi dest bixe. Herwiha piştî avakirina Mala Jin û çareserkirina gelek doz ji aliyê wê ve, êdî jin li dijî tundî û neheqiyê bêdeng nemînin. Her jina ku zorî û neheqî lê tê kirin yekser berê xwe dide me û doza mafê xwe dike."

Behiya bal kişand ser pirsgirêkên ku herî zêde tên ber destê wan û wiha pê da çû: "Piraniya dozên ku di sala borî de ji me re hatîn, yên revandina keçên biçûk ji malên wan û nakokiyên navbera jin û mêr bûn. Ev pirsgirêk jî tev ji ber hişmendiya civakê ya paşverû û zihniyeta zilamê desthilatdar e."

**Serjimariya pirsgirêkên 2022`an û çareseriya wan**

Behiya Mûrad jimara dozên îsal ji wan re hatîn û yên çareserkirîn, anî ser ziman û got; dozên hatîn evin



-Nakokiyên navbera jin û mêr: 482 doz, Yên hatîn çareserkirin 369'in.
-Nakokiyên malbatî: 41 doz, Yên hatîn çareserkirin 38'in.
-Nakokiyên Giştî: 31 doz, Yên hatîn çareserkirin 29'in.
-Mîras: 8 doz, Yên hatîn çareserkirin 5'in.
-Deyn: 3 doz, Tev hatin çareserkirin.
– Pir zewacî: 11 doz, Yên hatîn çareserkirin 3'in
-Zewicandina zarokan: 9 doz, tev hatin çareserkirin.
-Xiyanet: 6 doz, Yên hatîn çareserkirin 5'in.
-Şidet û lêdan: 6 doz, Yên hatîn çareserkirin 2'in.
-Revandina ji malê: 72 doz, Yên hatîn çareserkirin 61'in

Rêvebera Mala Jin ya bajarê Qamişlo Behiya Mûrad di dawiya axaftina xwe de got, em bi hêvî ne di vê sala nû de tevayiya pirsgirêkên nehatîn çareserkirin çareser bikin û nakokiyên bi jinan re derbas dibin kêm bibin. Herwiha sala 2023'yan tundî û şideta li ser jinê jî bi dawî bibe. Wek Mala Jin heta em bikarin emê ji pirsgirêkan re cihê çareseriyê bin û mafê jinêbiparêzin.

# Temenê mezin û rewşa koçberiyê jê re nebûn asteng

**Zana Roj/ Şehba**

**Jina kurd ya afrîner û kedkar a bi navê Zeyneb Xelîl, tevî hemû zehmetiyan jî, di bin çadirên koçberiyê de bi firotina xişiran zarokên xwe xwedî dike û debara jiyana xwe dike.**



Piştî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser Efrînê û koçberkirina gelê wê ji bo herêma Şehabê, welatiyên ku di kampa de bi cih bûn ji bo pêydakirina kar û debara jiyana xwe gelek zehmetî kişandin. Lê îradeya hin jinan ji zor û zehmetiyan xurtir e. Yek ji jinên xwedî îrade jî, yadê Zeneb e. Yadê Zeyneb ku ji beriya 5 salan ji Efrînê koçberî herêma Şehbayê bû ye û di kampa Berxwedan de bi cih bû ye, ji bo debara jiyana xwe û zarokên xwe, di cihekî biçûk di nava bazara kampê de firoşgeheke biçûk ya xişiran vekiriye û ji sibehê heyanî êvarê tê de kar dike.

Dayîka bi navê Zeyneb Xelêl a 52 salî, ji bajarê Efrînê ye û li herêma Şehbayê di kampa berxwedan de bi cih bûye ji bo me çîroka xwe vegot.

Dayîka Zeyneb weke her jinek û dayîkek ji Efrînê, piştî dagirkirina Efrînê derbasî herêma Şehbayê bû. Di şert û mercên zehmet de ji nû ve jiyaneke nû ji xwe re da sazkirin. Bê guman rewşa koçberiyê û zehmetiyên ku rastî wê hatine pir bi bandor bûn. Lê weke jineke Kurd ya xwedî hêz û îrade, ji bo derbaskirina zehmetiyên jiyanê dest bi kar kir .

Zeyneb 3 zarokên wê hene û tevî zarokên xwe di kampa berxwedan de jiyan dikin. Ji bo zarokên wê bikaribin xwendina xwe berdewam bikin, herwiha ji bo ew û zarokên xwe hewcedariya tu kesî nebin, tevî kêm derfetan jî firoşgeheke biçûk di suka kampê de vekir.

Yadê Zeyneb beriya ku sîstema Kampê bê danîn, ango beriya 4 salan li ser riya kampê, tiştên weke leystokên zarokan û alavên malan difirotin. Ew bi karê xwe pir ser bilind bû û ji xwe re ew kar weke gava yekem ya pêşketin û avakirina jiyana xwe didît.

Beriya 3 salan jî yadê Zeyneb foroşgeheke biçûk di suka kampê de vekiriye, di firoşgeha xwe de tiştên cur be cur difrotin. Firoşgeha wê jî di encama îsrara wê de hat avakirin. Di şert û mercên zehmet yên zivistanê de; tevî serma zêde jî, yadê Zeyneb ji seat 8'ê sibhan heyanî 7 êvarê li ser karê xwe dimîne. Ji ber ku hevjinê wê jî bê kare, bi tenê debara mala xwe û zarokên xwe dike.

**'Pêngavê yekem di bin serweriya zilam de derkeftin, karkirin û aboriya xwe avakirin e '**



Yadê Zeyneb di nava axaftina xwe de ji bo jinên karker wiha got: "Her jinek û dayîkek xwedî hêz û îradeyek pir mezine, karkirin ji bo jinê wesîleya yekemîn ya ji bin serweriya zilam a kevneşop, derketine, ji ber wê ez dibêjim her jinek divê kar bike, divê jin destekê bidin hev û tu carî xwe bê hêz nebînin".



# Li Mexribê pêşengeha hunerî gelek kes anîn cem hev

Pêşengeha bi nave "Navika Hunerê" gelek hunermendên Mexribî yên xwedî şêwaz û nêrînên curbecur anîn ba hev. Armanc bi pêşangehê ew e ku di pêşerojê de ber bi hemû afrînerên Mexribê ve biçin.

Li bajarê Dar El-Beydaa yê girêdayî Mexribê, çalakiyên pêşengeha komî Navika Hunerê berdewam dikin. Ev pêşengeh bi beşdarbûna şeş şêwekarên jin di aliyên hunerî yên cuda de pêk hat, piraniya wêneyên wan bi rengên gulî ne, ew jî nîşane ye ku nêrîna hunermendên jin ji bo pêşerojeke baş e.

Pêşengeh roja Çarşemê, di 11'ê Çileyê de vebû û dê heya 7'ê Sibata 2023'yan berdewam bike. Bi amadebûna hunermend, afrîner û nivîskaran hewaya hunerî û çandî serdest e.

**'Di navbera hunermend û tabloyan de tekliyek bêhempa heye'**

Hunermend Amal El-Fatah a ku bi hevkariya komeleya piştevaniya jinan, li derdora mehekê tabloyên xwe nîşan dide dibêje: "Girêdanek xurt di navbera jinan û tabloyên wan de heye. Weke çawa dayik û zarokên xwe bi navikê bi hev re tên girêdan, ya di navbera hunermend û tabloyan de jî wisa ye, ew têkilî bêhempa ye. Jixwe navê pêşengehê, ji ber vê rastiyê "Navika Hunerê" ye."





**'Di tabloyên xwe de felsefeyê nîşanî jinan didim'**

Amal Felah bi 8 tabloyan beşdarî vê pêşangehê dibe û têde ezmûna xwe bi gelek mijaran re nîşan daye. Bi taybetî rewşa jinan bi hemû awayan, di tabloyên wê de bi gelek peyaman xuya dibe. Ew xwe dispêre rengên mijaran, her dem hewl dide tiştên nû biafrîne ku xizmeta riya wê ya hunerî bikin.

Amal Felah nêrînê xwe der barê pêşengehê wiha tîne ser ziman: "Di tabloyên min de kesayetek heye ku bi her tabloyekê re tê guhertin bêyî ku em nêzîkî kêliyên taybet bi bedena jinan bibin. Ez li ser cihên hebûna jinan teqez dikim, jin weke ruh, mejî û hebûnek bi xwe taybet û ji temamkirina tabloyê ji temaşevan re dihêlim ku ji bîra xwe li gorî xwe tabloyan bibîne. Ez naverokek taybet û felsefîk nîşand didim. Ji ber ku jin ne tenê beden e, ew ruh e jî. Di tabloyên xwe de ez jinan dûrî beden xêz dikim û vedigerînim girîngiya wan. Bi hemû mekanîzmeyan xurtkirin û pêşxistina jinan esas digrim. Divê destpêkê wekhevî di navbera jinan de pêk were. Îro jinên Mexribî bi awayekî baş di tevgera şêwekariyê de amade dibin, gelek jinan hebûna xwe bi xurtî di hemû warên afrandin û beşên hunerê de îsbat kirine."

**'Pêşangeh ji bo hêza komî pir girîng e'**

Rêvebera hunerî ya pêşengehê Meryem Hemîş jî der barê nave "Navika Hunerê" de dibêje: "Navik çavekî girtî, zane ye lê nabîne. Temaşevan tabloyên 6 hunermendên Mexribî yên jin dibînin. Ew jî Zeyneb Mizwer, Fatne Şinan, Nadiya Şlawî, Yasmîn Bilmilîh, Anber El-Meqrî û Emel El-Felah in." Pêşengeh têkiliya navbera hunermend û karên wan de weke dayik û zarokê xwe dibîne û hemû hunermenên jin ên Mexribî nîşan dide. Ev girêdanek baş e ew weke jin sûdê ji ezmûnên hev digrin.

Meryem Hemîş di gotinên xwe de bal kişand ser girîngiya pêşangehê ji bo hemû hunermandan û got: "Pêşengeh girêdana navbera hemû hunermendên ji bo xurtkirina hêza komî nîşan dide, şêwazên van hunermendan curbecur in, nêrîna wan jî cuda ye, dê rê li pêşiya hemû hunermendên Mexribê veke."

**'Hêza jinan di warê cewherî fikrî de ye'**

Îman Lexfî ya ku di pêşengehê de cihê xwe girtiye jî dibêje: "Min serdana pêşengehê kir û li ser ked û afirandina hunermendên şêwekar ên jin ez rawestiyam. Ew hunermend bi rengan têdikoşin, tablo nêrîna taybet a hunermendan nîşan didin. Ez dibînim ku jin ne tenê ji bedenê pêk tên. Ew wate û hebûn e û hêza wê ya esas di ware cewherî û fikrî de ye."
**JÎNHA**

# 57 sal û 700 berhem

**Hunermendê navdar ê Kurd ê ji Mehabadê Mihemed Mamlê - weke Mamlê navdar e- 13 Çileyê 1999´an li bajarê xwe Mehabadê wefat kir, yanî beriya bi 24 salan. Ew sala 1925´an li Mehabadê hatibû dinê.**

Mihemed Mamlê bi stran û sirûdên xwe tê naskirin.Ew ji ber kar û barê kurdayetiyê gelek caran hatiye girtin û di zindanan de jiyana xwe derbas kiriye. Weke nimûne, di 29'ê Sibata sala 1948'an de ji ber ku helbestekî bi navûdeng a Hejar Mukiryanî kir stran hatibû girtin.

**Navê şaş bû navê malbatê**



Navê Mamlê ji ber şaşiyek di dema tormarkirina nav de, ev navê herêmî ji bo malbata wan maye. Dema ku navê Mam Elî bi Mamlê tê tomarkirin, ev jî dibe nasnavê vê binemalê. Xwendina seretayî li Dibistan Pehlewî û Seadet a Mahabatê temam kir.

Her çiqas di nava malbata Mamlê de çend hunermend û dengxweş hebûn jî, lê yê herî derketî pêş Mihemed Mamlê ye.

Piştî mirina bavê wî û birayê wî Mîrza Hisênî, Mamlê karî nûnerê hunerî yê vê malbatê 50 salan bi awaz û stranên Kurdî berdewam bike.

**Bêhtirî 300 berhemên wî bi xwe**

Yek ji stranên deriyê hunerê ji Mamlê re vekir, strana 'Royî bi cihêyî hiştim' bû ku di sala 1938'an de tomar kiribû. Li gorî çavkaniyên dîrokê di nava 57 salên jiyana hunerî de nêzî 328 stran tomar kirine.

Mamlê xwedî 700 berhemên hunerî ye ku ji vane 300 heta 320 ji aliyê wî bi xwe ve hatine hilberandin. Hemû di pirtûka Yadî Bexêr de hatine tomarkirin. Herwiha hinek stranên floklorî jî li gorî awaza xwe ya taybet gotiye. Mamlê di sala 1994'an de strana herî dawî tomar kir. Ji wê salê ve êdî bi nexweşiyekî giran ket. Piştî 5 salan Mamlê di 74 saliya xwe de, roja 23'yê Çileya sala 1999'an piştî nîvro, li bajarê Mahabadê yê Rojhilata Kurdistanê koça dawî kir û xatir ji dinya gewrik xwest.

Cenazeyê wî li goristana Mehabadê ya bi navê Bûdak Siltan hate definkirin.

**Xelatên Mamlê**

Navenda Hunerî ya Mamlê ji sala 2010´an ve Xelata Hunerî ya Mamlê didin hunermendekî. Sala 2010´an Qala Merre hêjayî vê xelatê hatibû dîtin. Sala 2014´an Nasir Rezazî ev xelat wegirtibû. Xelîl Xemgîn jî sala 2018´an hêjayî xelatê hatibû dîtin. Sala 2019´an hunermendê ji Kirmaşanê Husên Sefamenêş ev xelat wergirtibû.
*-Ozgurpolitika*

# Hêza hunerê ji bo guhertina civakê

**Mamostayên Hunerê û Şanogeran diyar kirin ku pêwîste waneyên hunerê li dibistanên dayikê ve werin dayîn û girîngiyê bidinê û gotin: "Ew hêza hunerê ji bo guhertina civakê heye, tiştek din nîne."**

Her çiqas li cîhanê, huner û sînema amrazek ya gihandina peyame ye û guhertinek mezin di sîstema siyasî û tomarkirina bûyerên dîrokî de rol dilîze, lê li Herêma Kurdistanê ev alî hatiye paşguhxistin û nekarîne



bi riya huner û sînemayê ew zilm û komkujiyên li ser gelê Kurd hatine kirin, ji cîhanê re ragihînin.

Li ser vê mijarê Mamosteya Beşa Hunerê Jîwar Omer ji Rojnews'ê re axivî û got: "Li gorî salên din huner



zêdetir pêşketiye. Ev pêşkeftin jî ji ber hebûna navendên hunerî yên li bajaran in. Berdewam derwe ji bo wan kesên hez ji hunerê dikin tên vekirin. Pêwîste em hemû berê xwe bidin hunerê, ji bo ku zêdetir pêş bikeve. Ji ber ku bi hunerê dikarin jiyana ferdan û di nava civakê de guhertinê çêbikin."

Şanoger Herdî Hesen diyar kir ku niha li Helebce li gorî deverên din ên Herêma Kurdistanê huner di astek baş de ye û got ku tenê bi riya hunerê dikare di nava civakê de guhertin were kirin û got: "Ew hêza hunerê heye, dikare derxistina heqîqetê be, ti tiştek din wiha bi bandor nîne. Divê hikûmet, aliyên peywendîkar û Sendîkaya Hunermendan li gorî karîna xwe, ji bo afirandina rewşek guncav a ji bo pêşxistina hunerê hewl bidin."

Şanoger Herdî Hesen diyar kir ku divê li dibistanan û dibistanên dayikê perwerdeya hunerî li ser waneyên din serwer bibe, ne salê carekê waneyek hunerî hebe û were paşguhxistin û got: "Bi vê rê dikarin ferdên Kurd perwerde bikin. Wiha bikin ku ku huner bibe yek ji tişta me ya herî baş. Di nava civakê de her kes kar li ser bike."- **ROJNEWS**

# Komîteya Sotemeniyê: Eger derfetên me hebin emê careke din mazot li welatiyan belav bikin

Li Qamişlo welatî daxwaza beşa duyem ya belavkirina mazotê ya malan dikin. Li ser vê jî Komîteya Sotemeniyê ya bajarê Qamişlo got, Eger derfetên me hebin û beşek din ji mazotê bi dest me bikeve, emê careke din mazotê li welatiyan belav bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Heta niha Komîteya sotemeniyê ya bajarê Qamişlo, 17 milyon û 294 hezar û 900 lître mazota germkirinê li ser welatiyên bajêr belav kiriye. Di derheqê mijarê de welatiyan diyar kirin ku 300 lîtreyên ku komîteyê li wan belav kiriye, ji bo dawiya zivistanê têra wan nake û daxwaza beşa duyem ya mazotê kirin.







Mazota germkirinê madeyeke pêwîst e ku her malbatê di demsala zivistanê de bikar tîne. Da ku xwe ji sermaya dijwar ya zivistanê biparêzin. Ji bo wê jî Komîteya sotemeniyê her sal bi hatina zivistanê re û bi armanca xizmeta civakê û alîkariya welatiyan, mazota germkirinê li welatiyan belav



dike. Herwiha komîteya belavkirinê berî ku serma dest pê bike, mazotê radestî malbatan dike. Li bajarê Qamişlo jî belavkirin ji destpêka Tîrmeha 2022`an ve dest pê kiriye û heta niha jî berdewam e, ji ber ku rêjeya mazotê ya ku li ser welatiyên bajarê Qamişlo hatiye belavkirin gihiştiye 17 milyon û 294 hezar û 900 lîtreyan.

**Heta niha 57 hezar û 104 malbatan madeya mazotê wergirtine**

Li bajarê Qamişlo jimara malbatên ku mazot li wan hatiye belavkirin nêzîkî 57 hezar û 104 malbat e. Belavkirin li hemû taxên bajêr bi dawî bûye, lê hê jî berdewam e. Lewra hin malbat hene vê dawiyê navê wan di lîsteya belavlkirinê de hatiye qeydkirin û niha mazot li wan tê belavkirin.

**Ji bo her malbatekê 300 lître mazot hat dayîn**

Komîteya sotemeniyê di sala 2022`an de ji bo her malbatekê 300 lître mazot da. Bihayê lîtreyek mazot jî 150 lîreyên Sûrî ye û her malbatek 300 lître ku bermîlek û nîv dike, wergirt. Derbarê qaseya mazotê ya ku Komîteya Sotemeniyê li malbatan belav kirî, gelek welatiyên bajarê Qamişlo nerazîbûna xwe li hember kêmbûn û netêrkirina mazotê ya heta dawiya zivistanê anîn ziman.

**`300 lître mazot têra demsala zivistanê nake`**

Welatiyê bi navê Ferhan Izat yê ji Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo diyar kir ku qeseya mazotê ya ku wan wergirtiye, zêdetirî 2 mehan têra wan nake û axaftina xwe wiha domand: "Ev çend rojin em bê mazot in. Ji ber ku 300 lîtreyên ku me di destpêka zivistanê de wergirt ji bo malbatekê kême û têra demsala zivistanê bi giştî nake. Niha jî sermaya dijwar nû dest pê kirye û em bê mazot man. Zarokên min tev ji ber sermayê nexweş ketine."
Ferhan di berdewamiya axaftina xwe de got, ji bilî mazota ku ji milê Komîteya Sotrmeniyê hat belavkirin ti mazota din bi dest me nakeve. Lewra mazota li deverên cûda bihayê wê bilind e û derfetên me nînin.
Ferhan Izet di dawiya axaftina xwe de daxwaz ji Komîteya Sotemeniyê kir ku beşa duyem ji mazota germkirinê ji wan re peyda bike û li tevayiya malbatên hewcedar belav bike.

**`Malbatên xwedî zarok 300 lîte mazot têrawan nake`**

Welatiyê bi navê Ehmed Salih jî destnîşan kir ku hin malbat 300 lître mazot têra wan dike hin jê jî têra wan nake û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Malbatên ku zarokên wan yên piçûk hene, mazota germkirinê pir bi kar tînin. Da ku zarokên xwe pê gerim bikin û ji sermayê û nexweşiyan biparêzin. Ji bo wê jî malbatên xwedî zarok 300 lîte mazot têrawan nake."

**`Îsal em nikarin sobê pir bi kar bînin`**

Ehmed Salih di dawiyê de got, îsal em nikarin sobê pir bi kar bînin lewra mazot kême û rojên serma û seqema dijwar li pêşiya me hene. Herwiha da ku mazot heta dawiya zivistanê têra me bike.
Mazota germkirinê li gorî sîstema kertan ya ku komînan, li gel tê belavkirin. îsal jî li hemû bajar û herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê beşa yekem ya mazota gerimkirinê ji milê komîteya Sotemeniyê ve hat belavkirin.
Ji bo ku em hê zêdetir mekanîzma belavkirina mazota germkirinê nas bikin Hevseroka Komîteya Sotemeniyê ya bajatê Qamişlo Feryal Ibrahîm ji me re axivî û diyar kir ku wan îsal zu dest bi belavkirina mazota germkirinê kirin û wiha pê da çû: "Her sal belavkirin dereng dikeve, lê îsa me hewl da ku di demeke zû de radestî welatiyan bikin da ku dema serma çêbibe, welatî pêwîstiya xwe ya bikaranîna mazotê pêk bînin. Herwiha got, îsal gel bi me re alîkar bû û hevkariya wan ya bi me re barê me sivik kir."

**`Eger derfetên me hebin, emê careke din mazotê li welatiyan belav bikin`**

Firyal derbarê Qalîteya mazota germkirinê ya ku di Sala 2022'an de hatiye belavkirin wiha kir: "Qalîteya mazota ku ji bo germkirinê hat belavkirin, li gorî sala borî ne xirab e û ger miqdarên mazotê yên din hebin, emê careke din li malbatan belav bikin. Heta vê gavê biryarek fermî ji bo belavkirina beşa duyem nîne. Lê eger derfetên me çêbûn û mazot hat peydekirin, emê beşa duyem jî bidin welatiyan."

**`Emê xebatên xizmeta civakê bidomînin û zêdetir bikin`**

Hevseroka Komîteya sotemeniyê ya bajarê Qamişlo Feryal Îbrahîm di dawiya axaftina xwe de got, em li gorî îmkan û derfetên heyî, xizmeta gelê xwe dikin û heta em karibin emê xebatên xizmeta civakê bidomînin û zêdetir bikin.

# MÊR DIKUJE DEWLET DIPARÊZE

**Rûştem Başûr**

Ya rast mirov parçeyekî ji xwezayê ye û ji sedî sed bûyerên ku di xwezayê de jî rû didin, her wiha di mirov de jî diqewime. Lê di xwezayê de hevdû temamkirin, ango perdeya şermê heye, lê ev perde di mirovan de gelek kêm û xedar e.
Gelo zilamtî çi ye? Mirov çawe û bi çi awayî dikare terîf bike? Ger em îro ji zilamekî pirs bikin ku zilamtî çi ye û çawa ye, dê pir zêde bersivekî neyê dayîn, eger bersiv bide jî tiştek ji bersiva wî nayê fêmkirin. Wê di bersivdayînê de zihiniyeteke paşverû ya girêdayî zilamê serdest, hebe û ji bo ku xwe mafdar bide diyarkirin, gotinên xwe wê bike qanûn. Lê ji zanistiya tevgera PKK'ê, dixwaze xwe bigihîne wateya rast. Bêguman mirov dikare diyar bike ku her kesek di nava tevgera azadiyê PKK'ê de dikare cihê xwe bigre. Li hember zihniyeta serdest ya zilam jî têkoşînekî bê eman tê dayîn û armanc xwe gihandina kesayetên pêşeng ên Mazlûman, Zîlanan e.
Bêguman li gorî lêkolîn û îstatîstîkan êdî yekcar aşkera bûye ku rê û rêbazên li dijî çanda tecawizkar a ku ji hêla sazî û dewletan ve qaşo tê meşandin, tu encameke serkeftî dernaxînin holê. Lewre hemû lêkolîn û îstatîstîk nîşan didin ku êrîş û şîdeta li ser jinê û bi taybetî destdirêjî li seranserê cîhanê kêm nebûye û her roj rewş girantir dibe. Heta roj bi roj zêde dibe. Mirov divê bipirse: çawa dibe ku ev polîtîka û stratejiyên ji 50 salan zêdetire, li dijî şîdeta li ser jinê tê meşandin tu encameke erênî dernexistine holê? Piştî têkoşîna tevgerên jin û femînîstan ango ji salên 1960'î ve dewlet û gelek saziyên derveyî hikûmetan (NGO) plansazî, peyman û bernameyên demdirêj xistin meriyetê û bi van awayan xwestin rê li pêşiya newekheviya zayendî, şîdeta li ser jin û zarokan bigirin. Lê dema ku mirov li naveroka vê heyînê dinêre, nîqaş dike wekî tu bûyer neqewimîne tê hesbandin.
Em dibînin li her deverê cîhanê Jin rastî tundî û tecawizê tên, nexwasim ev li Kurdistanê gihaye astekî pir bilind. Wek minak; di vê dema dawî de li Silêmaniyê jinek ji hêla komek zilaman ve rastî êrişan hat. Ev bi serê xwe dide diyar kirin ku zihniyeta zilam çiqasî dixwaze hebûna xwe ya li ser Jin ê bide ferzkirin. Ji bona Jinê bi temamî bike malê xwe, vê carê serî li hin rêbazên cuda didin ku bikaribin bi vê şertî jinê bê deng bikin.
Ka em binêrin di encama çi de ev zihneyet derketa holê? Bêguman divê em carekî din diyar bikin ku ji bo hişmendiya baviksalarî hêz bi dest bixe, mirov nikare tenê bi nêçiriyê pênase bike û mirov nikare wekî pêwîstiya derketineke zagonî jî bigire dest. Ji ber ku zilam xwe li ser rasteqîna hêza zêde, kiriye berdevkê civakê û wisa kariya xwe li ser civak û jinê serwer bike. Ji bo wê pêwîst e em vê mijarê ji pêvajoya herî nêz ve reva bikin û diyar bikin ku zilam di encama hêza xwe ya fizkî û qurnazî de, kariye xwe wekî kesê serwer û bi hêz pênase bike.
Jin di civaka xwazayî de ji hemû aliyan ve pêşenga civakê bû û xwedî hêzeke bi bandor bû. Lê, şerê zilamê qurnaz yê yê li dijîwê ku bi hezar salan dom kirî, hêza xwe ya bingehîn ji dest dide û dibe mirova herî kêm a civakê ku mehkûmî koledariyekê herî berfireh tê kirin. Bê guman hemû koledariyên din jî bi koledariya jinan re girêdayî pêş dikeve. Lewma ger koledariya li ser şexsê jinan neyê dahurandin, koledariyên din jî nayên dahurandin. Ango mirov dikare diyar bike ku ger koletiya li ser jinan neyê derbaskirin, dê koletiya li ser civakê jî neyê derbaskirin.



# Êrîşên dagirkeriya Tirk bênavber dewam dikin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragehand ku artêşa Tirk a dagirker çeperên berxwedanê yên li herêma Çamçoyê carekê bi bombeyên qedexe û 7 caran jî bi çekên kîmyewî bombebaran kir.



**Navenda Nûçîeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di çalakiya hêzên wan li Zapê, dagirkerek hatiye cezakirin. HPG' ragehand ku artêşa Tirk a dagirker carekê bi bombeyên qedexe, 7 caran bi çekên kîmyewî, bi dehan caran jî bi obus, tank, hawan û çekên giran çeperên berxwedanê yên gerîla bombe kirin.
HPG'ê da xuyakirin ku di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Bazên Zagrosê de li herêma Zapê, di 13'ê Çileyê de saet navbera 11:50 û 12:50'an de li nêzî herêma Çemço ya nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê tîmên wan yên bi tevger bi çekên giran du caran li dagirkeran dan. Di vê çalakiya hêzên wan de dagirkerek hate cezakirin.
HPG'ê derbarê êrîşên ku artêşa Tirk a dagirker yên bi bombeyên qedexekirî û çekên giran wiha got: "Di 13'ê Çileye de çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî herêma Çemço ya girêdayî nehiya Şêladizê ya Amediyê ji saetên sibehê heta êvarê carekê bi bombeyên qedexekirî û 7 caran jî bi çekên kîmyewî hatin bombekirin. Di 13'ê Çileyê de qada ava Lolan a Xakurkê carekê bi balafirên şer hate bombekirin.
HPG'ê da xuyakirin ku di 13'ê Çileyê de qadên Geliyê Lolan û Girê Şehîd Kamûran ên Xakurkê, qada Berxwedanê ya Girê FM û çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî gundê Sîda û herêma Çemço ya nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê bi obus, tank, hawan û çekên giran bi dehan caran hatin bombekirin.

# Kongra Star 18'emîn salvegera damezirandina xwe pîroz kir

**Navenda Nûçeyan**

**Koordînasyona Kongra Star 18'emîn salvegera damezirandina xwe pîroz kir û got, em ê projeya xwe ya azadkirina tevahî jinan ji zilm û zordariyê ye û avakirina civakeke li ser hêmên demokrasî, azadî û wekheviya zayendane pêk bînin.**

Koordînasyona Kongra Star bi wesîleya 18'emîn salvegera damezrandina xwe daxuyaniyek nivîskî weşand.
Kongra Star di daxuyanuiya xwe de diyar kir ku sekna jinan ya sala 2022'yan diyar bû, bi dirûşmeya Jin, Jiyan, Azadî ku di serhildana Rojhilat û tevahî Îranê de, di şexsê Jîna Emînî de û bi pêşengtiya jinan hişt ku heya roja îro ev serhildan dewam bike û bi demê re veguheze




meşa azadiya jinan ya bê navber.

Kongra Star da xuyakirin ku di sala 2022'yan de herêm û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li hember êrîşên pir mezin, berxwedanek bêhempa nîşan daye û wioha domand: "Bêguman berdêlên mezin di encama van êrîşan de hate dayîn. Di şexsê leheng û sembolên berxwedana cewherî ya jinan şehîd Zeyeb Saroxan, Diya Hogir, Jiyan Tolhildan, Roj Xabûr, Barîn, Zîlan, Bêrîvan ,Nagîhan, Delal, Sosin, Nûjiyan, Mizgîn Rojhilat, şehîdên Gurza Gelan , şoreşgerên pêşeng ên li Parîsê hatin qetilkirin Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şaylemez û Evîn Goyî de em tevahî şehîdên xwe bi minetdarî bibîr tînin."

Kongra Star diyar kir ku berxwedana jinan ya li tevahî cîhanê, bingeha xwe ji nerazîbûnên hişmendiya netew-dewlet digire û li ser vê bingehî têkoşîna jinan bê navber didome û got: " Heta ku em mafên xwe yên xwezayî yên ku bi zorê ji me hatine standin bigirin, wê têkoşîna me bidome. Di 18'emîn salvegera rêxistina me Kongra Star de, dîsa bi helwesteke xurttir, îdîayeke bi hêzttir û hişmendiyeke xweparastinê, em ê projeya xwe ya ku armanca wê azadkirina tevahî jinan ji zilm û zordariyê ye û avakirina civakeke li ser hêmên demokrasî, azadî û wekheviya zayendane pêk bînin. Ev berxwedan encax bi hevgirtina jinan li tevahiya cîhanê û bilindkirina asta têkoşînê pêkan e."

Kongra Star destnîşan kir ku, di serdemek ku her diçe aloziya li Rojhilata Navîn mezin dibe de, wek rêxistinek jin bi rêxistinkirina jinan li tevahî qadan xebatên xwe pêk tînin û wiha got: "Di avakirina hişmendiya xwebûnê, azadîxwazî û xweparastinê de bi hemû rê û rêbazan me serkeftinên mezin bi dest xist. Her wiha li dijî her cure polîtîkayên serdestan me helwesta xwe nîşan da."

# Bangewaziya Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan li azadîxwazên cîhanê

**Navenda Nûçeyan**

**Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê bang li hemû azadîxwazên cîhanê kir ku têkoşînê bilind bikin, tecrîdê bi dawî bikin û azadiya fîzîkî ya rêber Ocalan pêk bînin.**

Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê bi daxuyaniyekê bang li azadîxwazên cîhanê ki ku li hemberî tecrîda li ser Rêber Ocalan têkoşînê bilind bikin.
Li Dijî tecrîda girangirî ya li ser Rêber Apo Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê daxuyaniyek da.
Însiyatîfê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku dewleta Tirk a faşîst hovîtiya xwe ya li ser Rêberê Navneteweyî Abdullah Ocalan didomîne û wiha got: "Rêber Apo ji ber tecrîda giran a 24 salan a li Girtîgeha Îmraliyê, di nava şert û mercên giran de dijî. Hemû daxwazên muwekîlên Rebertî bi hincetên pûç ên ku zêdeyî 21 meh in nikarin hevdîtinê pêk bînin. Tevî serlêdana parêzerên Buroya Serdemê ya ji bo hevdîtina bi Rêber û girtiyên Girtîgeha Îmraliyê re daxwazên xwe pêşkêş dikin jî, bi hinceta cezayê dîsîplînê ji 9'ê Îlona borî ve hatiye birîn, serlêdan hatin redkirin. Tevî bidawîbûna cezayê ji 9ê Kanûnê ve, qedexeyeke nû li ser rêber û 3 girtiyan hat sepandin da ku bi hinceta heman cezayê nekarin bi malbatên xwe re hevdîtin bikin."
Însiyatîfê wiha dewam kir: "Li vir divê em behsa xaleke girîng jî bikin ku tevî bangên hemû azadîxwaz û demokratan, hiqûqnas, akademîsyen, bîrmend û siyaset-




medar jî di nav de, dewleta Tirk bi israr e ku vê tecrîda nerewa li ser Rêbertî bidomîne, ji ber ku li gorî yasayên herêmî, navneteweyî û Tirkiyê, mafê Rêbertî heye ku bi malbat û parêzerê xwe re têkiliyê deyne. Lê mixabin Tirkiyê guhê xwe ji banga azadîxwazan re girt û çavên xwe kor kir ku van mafan nebîne û bi cih bîne. Bi vî awayî hemû yasa û zagonên navdewletî û cîhanî binpê dike û guh nade yasayên wê, lêbelê rêya tunekirin û tasfiyekirina Rêbertî dişopîne û li vir divê em ji bîr nekin ku berxwedaneke efsaneyî ya mezin heye. Li Îmraliyê berovajî vê polîtîkaya hovane, tasfiyeker a ku li ser Rêbertî tê meşandin, ev polîtîkaya ku wek polîtîkaya tasfiyeker a bi guman a li hemberî Kurdan û li dijî mafê ramana azad tê meşandin, tê kirin. Ev encama lihevkirina AKP û MHP û tifaqa wan, bi vî awayî Tirkiye ji bo gelên belengaz veguherandine girtîgeheke mezin. Ji ber vê jî berxwedan pêwîst e, ji ber ku gelê Kurd, Tirk û hemû gelên herêmê li hemberî vê neheqiya ku weke wehşeta çolê zerarê diçîne û li her derê belav dike, bê deng nemînin. Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê bang li her kesî kir ku têkoşînê mezin bikin da ku sala 2023'yan bibe sala bidawîkirina tecrîdê, azadiya rêber Apo û destpêka qencî, aştî û demokrasiyê.

# Ronahî Serhat: Jinan li hember pergala zayendperestî serî rakirin

**Endama Meclîsa PAJK'ê Ronahî Serhat diyar kir ku bê azadiya jinê tu pergal azad û demokrat nabin û got, tevahî jin li hember pergala zayendperestî serî rakirin e û bêyî azadiya jinê jî wekhevî û edalet nayê.**

**Navenda Nûçeyan**

Endama Meclîsa Partiya Azadiya Jinê ya Kurdistanê (PAJK) Ronahî Serhat tevlî bernameyeke JIN TV bû û nirxandina têkoşîna jinan kir. Ronahî Serhat diyar kir ku sedasal 21'ê wê bibe sedsala azadiya jinê û wiha got: "Niha qonaxa dawî ya moderníteya kapîtalîzmê ye. Moderníteya kapîtalîzm di nava krîzeke cidî de ye. Li seranserê cîhanê li her derê û di nava civakan de krîzên pir cîdî hene. Di roja me ya îro de yek ji krîzên herî girîng jî, ya aborî ye. Bê karî û feqîrtî zêde bûye. Krîza ekolojîk zêde bûye, krîza avê her diçe zêdetir dibe. Êdî civak nikare vê siyaseta moderníteya kapîtalîzm ya ku li ser civakê dide pêkanîn tehemûl bike. Hêzên hegemonîk projeyên kûrevî datînin holê. Ji bo ku xwe ji nû de çêbikin niha giraniya xwe dane Rojhilata Navîn, di Rojhilata Navîn de jî Kurdistan heye û navenda wê jî jin e. Eger ku em têbikoşin, di bername û stratejiya xwe de şaşitî nekin, di hêla polîtîka û rê, rêbazên wê de şaşitî nebe; kêmasî dernekeve holê, bêguman ev yek tenê bi me re jî girêdayî nîne, tevahî hêzên şoreşger ên jin û gelan vê yekê bibîne û bêguman dîtin jî heye, wê demê em dikarin sedsala 21'ê bikin sedsala azadiya jinê."

**'Divê hişmendî, çalakbûn û avabûn bi hev re werin meşandin'**

Ronahî derbarê rê û rêbazên têkoşînê ku pêwîstiya jinan bi wan heye wiha got: "Girîng e ku em li ser rastiya kapîtalîzmê bisekinin. Hem paradîgma, hem amûrê wê, hem siyaseta wê di her alî de eger baş fêhm nekin, wê demê wê amedekariyên mirovan kêm be. Eger giraniya xwe bidî aliyekî wê aliyê din vala bimîne, divê yek qat vala nemîne ango teorî, pratîk, têkoşîn, şoreş avakirin bi hev re were meşandin. Çiqas xebatên zihnî, ewqas pratîk, ewqas şoreşgerî, çalakbûn, ewqas jî avabûn pêwîst e. Zihn, çalakbûn û avabûn divê bi hev re were meşandin, divê yek ji yekê qut nebe."

**'Jin li hemberî pergalê bi hêrs bûye'**

Ronahî da zanîn ku jin li hemberî pergalê pir bi hêrs bûye û wiha got: "Li hember mezinbûyîna krîzan, protesto jî zêde dibe û heman demê alternatîfa wê jî bi hêz kiriye. Krîz ewqasî kur e û li her deverê heye û di asta awarte de ye. Lê, di asta awarte de jî bersivê di xwe de dibîne, ev hêviyek gelek mezin e. Di sala 2010'an de 13 welatên Ereb serî rakirin, vê yekê jinan pêk anî. Li Polonyayê, Arjantîn, Spanyayê, Meksîkayê û Şîliyê Jî bi milyonan jin tevlî giravê bûn. Li Kurdistanê jî weke jinên Kurd, tevgera azadiya jina Kurd û civaka Kurd qet nesekinî ye. Ev ji bo me peyaman dide. Tevahî jin li hember pergala zayendperestî serî rakirin"

**'Hevgirtina jinan destkeftiyeke girîng e'**

Ronahî diyar kir ku di nava jinan de lihevhatinek heye û wiha domand: "Her çiqasî birdozî, siyaset, nêrîn û partî cuda be jî lê ev cudabûyîn ji bo hevgirtina jinan nabe asteng. Ev destkeftiyek gelek girînge. Jin li hember pergalê gelek bi hirse, bi kîne, tinê bi cihekê re sînordar namîne, li Rojhilata Navîn destpê dike, derbasî Ewropa dibe û ji wir derbasî cihên din dibe. Jin bi hevre destpê dikin û di meşin. Di van hemû xwepêşendanan de ev bi hevre tê meşandin. Dema hêzên



hegemonîk nikarin civakê bêxin bin kontrola xwe de, wê demê zextan zêdetir dikin. Li aliyekê de hêzên alternatîf, hêzên anarşîst, femînîst, tevgerên çandî, hêzên dijberê pergalêne jî brxwe didin, dibe ku hemû bi hevre weke eniyekê bi hêz nebe lê hev temam dikin. "

**'AKP'ê li ser jinan û li ser tevahî civak zextê dide meşandin'**

Ronahî diyar kir ku li Tirkiyê hemû rojev li ser hilbijartinên îsal e û wiha got: "AKP'ê ketiye weswasê de ji bo ku cardin hilbijartinê de ser bikeve , di serî de li ser jinan û li ser tevahî civak zext dide meşandin . 22 sale desthilatdarî û faşîzma AKP-MHP bi destê çeteyên xwe şer kûr dike. Ji bo şer kûr bikin tevahî aboriya xwe ji bo şer dide. Ji bo careke din di hilbijartinê de têk neçe, tevahî amorên gelan ji destê wan digre û desthilatdariya xwe bikartîne. Ji ber vê yekê pêwîste tevahî jin, ciwan, xwandevan bi rihê şoreşa 1968'an, bi rihê Apoyî ve sedsala 21'ê bikin sedsala xwe. Bêguman bedelê vê yekê hene, destketiyên wê jî hene û derfetê vê yekê jî pir in."

**'Bê azadiya jinê wekhevî û edalet nayê'**

Endama Meclîsa PAJK'ê Ronahî Serhat da xuyakirin ku desthilatdarî, mêtinger, hêzên hegemonîk, hêzên netewe dewlet, faşîzmê bi kêliyekê jî nasekine û wiha domand: "Desthilatdar di her qadê de û bi her şewazê 24 saetan êrişekê topyekûn li ser gel pêk tîne. Ji ber vê yekê 24 saetan azadî xwastin, têkoşîn kirin, zindî bûyîn û li gorî vê jiyan kirin pêvîste. Li hember pergalê tevahî xwepêşandan, serî rakirin nirxe û wateyek xwe heye, rolekê xwe heyê. Êdî bê azadiya jinê tu pergal azad nîne, bê azadiya jinê tu pergal ne gengaze ku demokrat bibe, bê azadiya jinê wekhevî û edalet nayê. Pêwîste tevahî bernameyên tevgerên azadî xwaz jî li gor vê yekê be."

## 2023....

**Farûk Sakik**



Me saleke din li dû xwe hişt. Gelek kes û aliyan mihasebeya sala bihurî kirin. Ji bo sala nû plansaziyên xwe çêkirin. Hîn jî li ser sala 2022'yan nirxandin tên kirin. Kurd jî ji aliyê xwe ve sala bihurî dinirxînin, mihasebeya wê dikin. Plansaziya xwe ya sala ku nû dikin.

Heke mirov bibêje bendewariyên herkesî ji sala 2023'yan cuda ye, wê ne şaş be. Bendewariyên dagirkeriya Tirk û bendewariyên gelê Kurd helbet ji sala 2023'yan ne wekî hev e û ne mimkûn e ku weke hev bin jî.

Bendewariyên herkesî yên cuda ji vê sala nû hene. Ji aliyê Kurdan û dewleta Tirk ve Lozan esas tê girtin. Ji bo vê yekê reqama 100 sal dane pêşiya xwe. Kurd ji bo ku sed sal berê di peymana Lozanê de welatê wan hatî parvekirin, bê statu hatine hiştin, dixwazin dawî li vê dîroka bêyom bînin û Kurdistanê azad bikin.

Dewleta Tirk jî dixwaze axa xwe ya bi peymana Lozanê re ji dest daye ji nû de bi dest bixe. Ji wê sînorê xwe yê wê demê re dibêje 'Mîsakî Mîllî'. Di nav van sînorê wan de axa Başûr û Rojavayê Kurdistan jî hene. Ji Kerkûk heta Helebê xeyalên wan ên dagirkirinê hene. Di lîteraturê re ji vê siyaseta wan re 'neo-osmanî' tê gotin. Yanî dixwazin osmanitiyê di vê sedsalê de zindî bikin.

Xeyal û stratejiya wan ew e lê di vê xeyala xwe ay dij-kurd de, paritiyeke ku navê Kurdî li xwe kiriye bi kar tînin. Yan jî PDk xizmetji siyaseta wan a dij-Kurd re dike. Li aliyê din tirkmenên li herêmê ji bo berjewendiyên xwe bi rêxistin dikin. Ne ji bo ku xwedî li wan derkevin, ji bo ku dikarin wan bi erzanî bi kar bînin.

Dîsa ji bo vê xeyala xwe bi hikûmeta Şamê re jî didin û distînin. Ji ber ku Rojava li ber xeyalên wan weke ne weke kelem lê weke kelehekê disekine. Dizanin ku heta Rojava hebe, heta ew şoreşa bi pêşengiya jinêhebe, nikarin li gorî dilê xwe bidin xar û cirîda.

Ji ber wê ye hawar û gaziya xwe dibe ber derê Moskowê ku wan û Esad li hev bîne. Heyetên siyasî, eskerî û îstixbaratê li ser vê yekê dest bi hevdîtina kirin. Li Moskovê 3 wezîrên şer hatin cem hev. Di van rojan de jî wê wezîrên karê derve yê herdu dewletan hevdîtinek pêk bînin û ew jî bo hevdîtina Erdogan û Beşar bingehek destnîşan bikin. Dibe di van hevdîtinan de wê Tirkiye bi Şamê re hin bazariyên qirêj û gemarî bike. Dibe li ser herêmên kurdan hin soz jî werin dayîn.

Dema ku ev trafîk di navbera herdu dewletên dagirker ve çêdibûn, Kurdan jî ji bo sedsaliya Lozanê amadekariyeke mezin dikin. Kurd ji bo destketinên xwe yên di encama têkoşîna sedsalî de berxwedaneke dîrokî didin. Gerîla û şervanên Kurdan di warê leşkerî de, Tevgera Azadiyê di aliyê siyasî de û gel jî di aliyê civakî de sala 2023'an dixwazin bikin sala azadiya Kurdistan.

Çanda berxwedan û serhildanê ya di sala 1921'an de li Koçgirî destpêkirî, îroj PKK dewr girtiye û bi rê ve dibe. Di serhildana Koçgirî de siyasetmedar û pêşengê Kurdan xwestin soza dewleta Kemalîst dayî wan bi bîra wê bînin, lê rejima demê di 15'ê Çileya 1921'an de bi komkujiyeke mezin bi bêbextî bersiv da. Hingê bi Yunan re di şerekî de bûn û dixwestin Kurdan bixapînin da ku ev şer bi dawî bibe. Piştî ku şerê wan û Yunanan bi dawî bû, hemû hêzên xwe ye leşkerî şandin Koçgirî. Li Koçgirî komkujiyeke mezin pêk hat.

Lê îroj Tevgera Azadiyê-PKK ji wan deman tercubeyên mezin girtî. Îroj bi tu awayî bi siyaseta dijmin a xapandinê bawerî nayne. Bi hêza xwe ya cewherî bawerî tine û li gor wî tevdigere.

Mijarek ku bi vê sedsale re eleqeder, li Tirkiyê va di sala 2023'yan de hilbijartin hene. Erdogan bi salan e behsa van hilbijartinan dike. Reqama '100' sembolîk be jî dixwest di vê salê de siyaseta xwe ya li dijî Kurdan a qirkirinê bi encam bike. Ji bo kurd tevlî vê hilbijartinê nebin hewl didin ku partiya Kurdan HDP'ê bigirin. Ji bo kampanya hilbijartina sabote bikin, bêtesir bikin, alikariya xzîneyê ya ji bo HDP'ê dane seknandin.

Li hember van kiryara HDP hemleyek kir û got; em ê bi namzetên xwe tevlî hilbijartinan bibin. Partî wê were girtin an na, lê HDP jî hin tedbîrên xwe girtiye.

Wek di destpêkê de jî me got; kurd û tevgera pêşeng a Kurdan ne wek ya Koçgirî bêçare nîne. Berevajî xwedan hêz in, pêşengek û rêberekî ku di her şert û mercî de perpektîfên çareseriyê pêşkêş bike heye. Ji bo vê yekê Kurd di sedsaliya Lozanê de di ajandaya ku dayî ber xwe de azadiya Rêber Apo jî lê zêde kirine.



# Dagirkeriya Tirk Jinên herî jîndar di cîhanê de dike armanc

Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, jina Kurd ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê têkoşînêke xurt pêşxist û ji bo jinên azadîxwaz yên cîhanê bû pêşeng. Dewleta Tirk û hêzên hegemon jî, jina azad li ser desthilata xwe xeter dibînin û wê dikin armanc.

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Civaka Kurd, civakek her dem bi komkujiyan re rû maye, nasname, ziman û çanda wê hatiye înkarkirin, ji ax û walatê xwe hatiye koçberkirin e. Gelê Kurd li dijî dagîrkeriyê hertim têkoşîna hebûnê kiriye, lê ti carî ji mêtîngeran re sitû netewandiye.

**Jina Kurd dîroka berxwedana jinê nivîsand**

Di erdnîgariya Kurdistanê de, ji sedsala 19' an heta sedsala 20' an gelek serhildanên Kurdan çêbûne. Di van serhildanan de herdem rola jina Kurd bingehîn e. Jinên Kurd di avakirina nirxên çandî û teşegirtina civakê de seknek birûmet nîşan daye. Di tevlîbûna serhildanan de, erka ku Jina Kurd girtiye ser xwe bala cîhanê gişandiye. Mînakên herî balkêş yên despêkê jî Zarîfe û Besê tê dayîn. Lê bi hezaran mînakên bi wî rengî hene. Di serhildanên Kurdan de ji sedsala 10'an heya sedsala 20'an erka mezin dikeve ser milê Jinê. Jina Kurd di her cure têkoşîna li dijî dagîrkerî û ferasetên wan ruhê xwe yê berxwedêr parastiye û timî xwe ji nû de şîn kiriye û bi vê sekn û tekoşîna xwe dîroka berxwedaniya jinê nivîsandiye.

**Jinên jîndar yên cîhanê û sucên dewleta tirk**

Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, berxwedana gelê Kurd û têkoşîna azadiyê gihşt qonaxeke nû. Herwiha hem di qada navneteweyî de û hem jî di Kurdistanê de ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê têkoşînêke xurt a jinan hat pêşxistin. Jinên Kurd pêşengî ji bo sistemeke nû ya demokrasiyê kirin û ispat kirin ku jinên herî jîndar ên cîhanê ne. Dewleta Tirk a dagirker ku ev zêdeyî



40 salan e, li dijî hebûna gelê Kurd û tevgera azadiya Kurdistanê şerekê hovane dide meşandin. Di serî de jinên Kurd yên pêşeng dike armanca êrêşên xwe. Dixwaze bi hedefgirtina jinên pêşeng, îradeya gelê Kurd yê azadîxwaz têk bibe.

Dewleta Tirk a faşîst siyaseta qirêj ya hedfgirtina pêşngên gelê Kurd û bi tabet jinên kurd yên pêşang dewam dike. Teybet di van 10 salên dawî de, ango piştî Şoreşa Rojava gelek komkujî li dijî jinên Kurd pêk anîn. Hima bêje dewleta tirk ya piştgira çeteyên hov yên DAIŞ'ê, ji tekoşîn û serkeftina jinên kurd ya dijî van çeteyan tol dihilde û êrişê vanjinên ku li dijî DAIŞ'ê şer kirî dike.

**Sucên dewleta tirk yên li dijî jinên kurd yên pêşeng**

Hin ji wan sucên dewleta tirk evin: Di 9'ê Çileya 2013'an de yek ji damezrênerên PKK'ê Sakîne Cansiz, nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez ji aliyê MÎT'a Tirk ve hatin hedef girtin û şehîd ketin. Di 12`ê Cotmeha 2019`an de, çeteyên dewleta Tirk li ser rêya M4 ya di navber herêma Cizîrê û herêma Feratê de, Serkertera Giştî ya berê ya Partiya Sûriya Pêşerojê Hevrîn Xelef tevî ajokarê wê Ferhad Remedan, şehêd xistin.

Di 23'ê Hezîranê de, dewleta Tirk a dagirker bi balafirke bêmirov endamên Koordînasyona Herêma Firatê ya Kongreya Starê Zehra Berkel û Hebûn Mela Xelîl û xwediya malê Emîne Weysî li gundê Hêlincê yê ku girêdayî Kobanê ye, kir aramanc û şêhêd keftin.

Di 25'ê Kanûna 2021'an de di êrîşeke dewleta Tirk a dagirker de, li kobanê Endamên Yekitiya Jinên Ciwan Viyan Kobanê, Nûjiyan Ocalan, Rojîn Îso şehîd bûn.

Ji Fermandarên YPJ'ê ku bi salan li dijî DAIŞ'ê şer kiribûn Jiyan Tolhildan, Roj Xabûr û Barîn Botan ji aliyê balafirên bê mirov ên dewleta Tirk ve, weke ku tola DAIŞ'ê rakirin di 22'ê Tîrmeha 2022'an de hatin hedef girtin û şehîd bûn.

Di encama êrişa balafireke bêmirov a biçek a dagirkeriya Tirk de di 18'ê Tebaxê de li dijî navendeke perwerdeyê ya keçan, li gundê Şemokê 4 zarok şehîd bûn û hin jî birîndar bûn; navê yên şehîd Eta, Zozan Zêdan, Dîlan Izedîn û Diyane Elo.


27'ê Îlonê dewleta Tirk a dagirker bi rêya balafirên bêmirov ên biçek her du hevserokên Nivîsgeha Edaletê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Zeyneb Saroxan û Yilmaz Şero kirin hedef.

4'ê Cotmeha 2022'an de, endama Akademiya Jineolojî, Desteya Weşanê ya Kovara Jineolojiyê Nagîhan Akarsel, li Silêmaniyê ji aliyê MÎT'a Tirk ve hat amac girtin şehîd bû.

Herî dawî disa ji aliyê MÎT'a Tirk ve di 23'ê Kanûnê li paytexta Fransa (Parîsê) li dijî Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya êrîşeke hovane pêk hat. Di êrîşê de Emîne Kara ya pêşengeke Tevgera Jinên Kurd, ji Tevgera Çandê hunermend Mîr Perwer (M. Şîrîn Aydin) û welatparêzê Kurd Abdurrahman Kizil şehîd bûn.

Dewleta Tirk a dagirker bi hedefgirtina jinên Kurd yên pêşeng, hewil dide di şexsê jina têkoşer de Îradeya Kurdên azadîxwaz têk bibe. Dewleta Tirk a faşîst ji beriya 10 salan pêvajoyeke nû li hemberî tevgera jin daye destpêkirin. Ji bo tasfiyekirina şoreşa jinê biryara kuştina pêşengên jinê girtiye. Di çarçoveya vê konseptê de di hundirê 10 salan de, him li Bakur û Rojhilatê Sûriyê him jî di parçeyên din û li derveyê welêt, bi dehan jinên pêşeng û şoreşger ji aliyê dewleta Tirk ve hatin qetilkirin. Ji ber ku hertim dewleta faşîst ya tirk azadiya jinê ji bo xwe metirsiyekê mezin dîtiye û kuştin, tecewîz, tecawîza zarokan, ya tûrîstan û bêmafdariya jinê jî, li Tirkiyê bi navûdeng e!

## AKP û HUDA PAR



**Ahmet AKTAŞ**

Teyîp Erdogan, ji bo ku temenê dîktatoriya xwe dirêj bike, ketiye pey her cûre lîstok, fêlbazî û canbaziyan. Ji bo vê armanca xwe, tu mafên mirovan, tu qanûnan û pîvanên exlaqî nasnake.

Ji bo temendirêjiya desthilatiya xwe; bêgûman karibe, wê ji derfetên heyî sûd bigre, an jî karibe derfetan biafirine da ku bi rêya hilbijartinan disa bê ser deshilatê wê bike.

Niha, hewldanên wî hemû li ser 'ka ezê bi kijan lîstokan di hilbijartinê de bi ser bikevim' e.

Ji bo vêya, du pêşbîniyên xurt hene.

Yek; girtina HDPê, li şûna wê xurtkirina HUDA PAR'ê

Dudu; paşvexistina dema hilbijartinan.

Ji bo vêya jî, divê şerê heyî gûrtir bike, an şerekî hîn mezintir lidar bixe. Mînak; xurtkirina êrîşên li ser Rojava û Başûr. Bi taybetî, dagirkeriya leşkeriya bejayî ya berfirehtir li ROJAVA. Mînakên din jî, lidarxistina şer li gel Îranê, Yunanê, Qibrisê û hwd.

Bi hilbijartinên asayî/normal, wê nikaribe bi serkeve, jiber şerd û mercên heyî de tu şansê wî nemaye. Lewma bi tenê rêyek dimîne ji bo serkeftinê, ew jî; hîlebazî û bikaranîna zordariyê ye. Jixwe hîlebazî û zordariyên wan jî, ji berê zêdetir û eşkeretir bûne. Ji hevserokên HDP'ê heta bi sedan rêveberên wê û bi dehhezaran endamên wê hatine girtin.

Bi girtina rêveberan ranawestin, êdî pêşbîniya xurt heye ku wê yekcarî HDP'ê bigrin. Her wiha, di kiryarên wan de xwuya dibe ku wê partiya herî nêzî wê DBP'ê jî bigrin, da ku Tevgêra Kurdistanî yekcarî nikaribe bi navê partiyên heyî beşdarî hilbijartinan bibin.

Li cihê HDP'ê, HUDA PAR amade kirine.

HUDA PAR, dewama Hizbulaha kevn e ku jixwe navê wê jî, ji Erebî wergerandin e Kurdî. Ev Partî, ji aliyê raya giştî ve û ji aliyê gelê Kurdistanê ve, weke kujerê/celadê Kurdan tê nas kirin. Serokê wê Huseyin Velioglu û Mele Enver Kiliçaslan bû.

Zihniyeta AKP, HUDA PAR û DAIŞ'ê yek e.

Xwediyê vê hişmendiyê, berî 3 mehan li AMED'ê bi navê Konferansa Yekîtiya Aliman, civînek mezin çêkir û ev civîn 2 rojan kişand. Teyip Erdogan, ji her 4 dewletên dagirker û ji her 4 parçeyên Kurdistanê "Alimên Kurdkuj" civandibûn. Her wiha braderên xwe yên TALÎBAN ên Efxanistanî jî beşdarî vê Konferansê kiri bû. Serkêşên vê civînê, dîsa Kurdên çar parçeyan bûn, lê malovanîtî HUDA PAR'ê kir û Mele Enverê Hizbullahî axaftina vekirina civînê kir. Lewma mirov dikarê bêje "civîna xiyaneta alimên kurd" bû.

Li gel ewqas fêlbazî û zordariya serbazî jî, di hilbijartinan de pêşbîniya serkeftina wan pir lawaz e. Jiber ku îrade û hişmendiya demokrasiyê ya gelê Kurdistanê gelek xurt e.

Bi tenê dikarin bi darê zorê serkeftina xwe ragihînin. Lê, wê nikaribin di raya giştî ya cîhanî de xwe bidin pejirandin. Lewma, gûmana mezinkirin û berfirehtirkirina şer û cengê derdikeve pêş. Jiber ku makezagona dewleta tirkan vê destûrê dide serokdewlet Receb!

Belê ev jî, nikare wî rizgar bike ji gelê Kurdistanê!

# Êrişên dewleta Tirk li Hesekê hatin şermezarkirin

***Meclisa Ciwanan a Partiya Sûriya Pêşerojê bi meşekê êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şermezar kirin.***

Meş ji pêşiya Parka Rêber Apo ya li taxa Nasira ya bajarê Hesekê dest pê kir. Ciwanan alên Partiya Sûriya Pêşerojê, pankartên bi nivîsên "Bi rihê şehîdên xwe û şehîdên Parîsê em ê li hemberî dagirkeriya Tirk bisekinin, destkeftiyên xwe biparêzin, Sûriyeke demokratîk, pirrengî û nenavendî ava bikin" û "Bi rihê têkoşîna Sara û Evînan em ê azadiya jinan mîsoger bikin" hildan û bê navber dirûşmên şermezarkirina êrişên dewleta Tirk a dagirker û silavkirina berxwedana QSD`ê berz kirin.

Meş li ber avahiya Komîteya Jîngeh û Şaredariyan a bajarê Hesekê veguherî mîtîngê. Berdevkê Meclisa Ciwanan a Partiya Sûriya Pêşerojê Fereh Salim daxuyanî xwend.

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku dewleta Tirk a dagirekr bi armanca têkbirina projeya Rêveberiya Xweser û yekitiya pêkhateyên herêmê êrişên xwe li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê didomîne.

Fereh El Salim anî ziman ku dewleta Tirk bi hinceta parastina ewlehiya xwe ya neteweyî, di nava bêdengiya navneteweyî de sûcên şer li dijî şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike.




Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Em weke Meclisa Ciwanên Partiya Sûriya Pêşerojê helwesta xwe û kombûna xwe li derdora QSD`ê tekez dikin û bi hemû hêza xwe amade ne destkeftiyên gelê xwe yên ku bi saya xwîna pak a şehîdan bi dest xistine gelê xwe biparêzin."

Mîtîng bi berzkirina dirûşmên dilsoziya bi şehîdan re û silavkirina berxwedana jinan bi dawî bû. ***ANHA***